Tu hez ji kîj bêjerê bernamê zarokan dikey?

Hemîyan bi taybetî (millet) î.

Tu hez dikey bernamên êkser pêşkêş key yan seredan û çavpêkeftinan?

Ez hez dikem biçime gerrîyanên bernamey bi taybet li cejna; çunkî di xoşin û ez zaroka dibînim.

Te çi serihatî heye di navbera bernamey da?

Carekê ez xelet bûm di nav bernamey da ku da bêjim: Ferimûn digel filim kartunê (tom û cêrî), min got: Kerem ken digel filim kartunê (heval û hîvî).

Tu çi dibêjî di nav bernamê zarokan da?

Ez despêk û dumahîya bernamey dibêjim û herwesa babet û hozanan dixwînim.

Te divêt li paşerojê bibî ye çi?

Min divêt bibime nojdara zarokan.

Supasîya te dikeyin kevîka ciwan û hîvîdarîn tu her ya zîrek û serkeftî bî?

Ez jî supasîya kovara sivore dikem bo vê dîdarê û daxwaza serkeftinê bo we dikem

.